Zarokên behremend

Ragir Nisiret Sîto

Dîdar: Hêja Weysî

Hevalê me (ragir nisiret sîto) li 2/1/1997 li Dihokê ji dayikbûye û qutabîyekê gelek zîreke li pola pêncê li qutabxana (behdînan) ya seretayî. (ragir) qutabîyekê çelenge di biwarê nivîsanê da û destê hozan nivîsanê yê hey û hozana liser gelek babetan dinivîsît.
Bo vê carê me wek kovara sivore hewil daye di vê dîdarê da, vî behremendî bo xwandevanên xo bideyne nasandin

---

Çawa hizra hozan nivîsînê bo te çêbû?
- Demê ezê biçwîk, min zarok di şaşa (K. Tiv Dihok) di nav bernamê zarokan û li nav ahengan da didîtin, ku hozana dixwînin, min gelek hez jê kir û min divîya ez jî hozana çêkem.

* Kî harîkarîya te diket bo arezûya te?
- Bi rastî kes ne, hema ez bixo dwîvçûna hozana dikem û hizra bo xo jê werdigirim.

* Tu kengî hozana dinivîsî?
- Piştî xwandina qutabxanê.

* Te nêzîkî çend hozana hene? Û tu çi lê dikey?
- Min nêzîkî (27) hozana yên heyin û min wekî pertûka hozana lê kirî ye û dê parêzim.

* Tu hez ji hozanên kîj hozanivanê kurd dikey?
- Hozanên (Ehmedê xanî), çunkî bi hêzin û bi ramanin û bi sanahîne bo jiberikirinê